# “Min vegerînin Kanadayê”

## Astengiyên li ber Kanadiyên ku li bakurê rojhilatê Sûriyê bi gumana têkildariya bi DAÎŞê re binçavkirî ne

### Kurte û Qewîtî

# Kurte

> “Rica dikim, min vegerînin Kanadayê. … Rica dikim, li min biborin, bihêlin ku ez weke xwe bim, wate Kanadî.”
>
> —Kimberly Polman, welatiyekî Kanadî ku li kampa malbatên DAÎŞê li bakurê rojhilatê Sûriyê hatiye binçavkirin.

Berî zêdetirî salekê, di Adara sala 2019an de, şervanên navxweyî bi alîkariya hevpeymaniya navdewletî ya bi rêberiya Amerîkayê, Rêxistina Dewleta Îslamî (DAÎŞ) ji wargeha xîlafeta wê ya dawî li bajarokê Baxozê yê Sûriyê derxistin. Tevî ku gelek kesên Sûrî dîl hatin girtin, şervanên ku bi navê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) tên naskirin û Amerîka piştgiriya wan dike, bi hezaran kesên din yên ku di bin sîbera DAÎŞê de dijiyan ku di nav de mêr, jin û zarokên ji zêdetirî 60 dewltan, lihev komkirin. Ji wê demê ve desthilatên li bakurê rojhilatê Sûriyê van kesên biyanî di rewşeke awarte û ne mirovahî de û di bin şert û mercên dijwar de ku bi piranî gefê li jiyanê dike, wan binçav dikin. Ev binçavkirin jî bi razîbûna Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAÎŞê ye, ku Kanada jî tê de endam e, pêk hatiye. Di nava van kesên binçavkirî de herî kêm 47 welatiyên Kanadayê hene.

Mîna biyaniyên din, ew kesên Kanadî bi tu tawanekê nehatine cezakirin. Di nava van kesan de 8 mêr, 13 jin û 26 zarokên, ku temenê wan di bin 6 salan re ye, hene. Rayedarên navxweyî herwiha rê nedaye ku ew kes bêne dadgehkirin û ne jî biryara binçavkirina wan ji aliyê dadgehê ve hatiye dayîn. Zarokên ku biryar nedane di bin sîbera DAÎŞê de jidayik bibin yan jî bijîn, tu hêviyeke wan ya vegerê tune ye. Di vê navê de, dibe ku kesên ku bi sûca têkildariya bi tawanên DAÎŞê re hatine binçavkirin, tu carî neçin pêşberî dadgehê.

Di zindanên demkî yên zilam û xortan de, xwarin pir kêm e û cî jî pir teng e bi awayekî gelek girtî mecbûr in mil bi milê hev razin. Ji naverasta sala 2019an û pê de zêdetirî 100 girtiyan, dibe ku bi sedan girtî jî bin, ji ber tunebûna çavdêriya tenduristiyê jiyana xwe jidest dane. Di kampên girtî de ku jin û keç û zarokên biçûk tê de ne, çadirên kampê di bin bayê xurt de dikevin xwarê yan jî di nav ava baranê yan jî ava karêz û mezraban de binav dibin. Hin jin ku herî kêm yek ji wan Kanadî ye, dibêjin ku ji ber ew piştgiriya DAÎŞê nakin lewra navê wan ketiye “lîsta kuştinê” ya wê grûpê. Av bi gelemperî gemar e yan jî kêm peyda dibe. Avdest xitimî ne, seyên berdayî çop û gilêşeya ku li ser erdê avêtî ye belav dikin herwiha nexweşiyên ku belayên vîrûsî jî çêdikin belav bûne. Çavdêrî û guhdana tenduristî jî bi tevahî ne bes e. Li gor Heyva Sor ya Kurdî, ji sala 2019an û pê de herî kêm 517 kes, ku di nav de 371 zarok hene, ji ber nexweşiyên ku dermankirina wan peyda dibe li navçeya Hol jiyana xwe jidest dane. Li vê navçeyê jî herdu kampên herî mezin yên jin û zarokan hene ku nêzîkî 65000 kes têde hatine binçavkirin.

Ev bi mehan e ku kesên Kanadî yên ku li vê kampê hatine binçavkirin tika û ricayê dikin daku vegerin warê xwe, di nava wan de kesên ku temenê wan zêdetirî 18 salan e hene û dibêjin ew amade ne ji ber gumanên derbarê têkildariya bi tawayên DAÎŞê re biçin pêşberî dadgehê. Di heman demê de malbatên wan li Kanadayê alîkarî ji hikûmeta Kanadî dixwazin daku merivên xwe vegerînin welat. Çar kes ji van malbatan jî çûne bakurê rojhilatê Sûriyê wek hewldanekê ji bo ku alîkariya merivên xwe yên binçavkirî bikin, lê hewlên wan sernegirtin. Rêveberiya Xweser jî ya bi rêberiya Kurdan li bakurê rojhilatê Sûriyê, ku ew kesên biyanî binçavkirine, gelek caran ji hemû welatan xwestiye ku welatiyên xwe vegerînin yan jî alîkariyên darayî bidin ji bo ku lêkolîn bi kesên gumnakirî re were kirin û li navçeyê bêne dadgehkirin.

Di sala 2018an de berpirsên Kanadî bi rêveberiya xweser re civiyan û derbarê proseyên vegeriyana wan kesan de danûstandin pêk anîn, lê Kanadayê tu welatiyên xwe venegerandin û ne jî rê li ber vegera wan hêsan kir herwiha nehişt ku zarokên mîna Emîra 5 salî ya sêwî, ku dibêjin bav û dayika wê û 3 xuşk û birayên wê di sala 2019an de di êrîşeke asmanî de li bajarokê Baxozê hatine kuştin, vegere.

Ev rapor vê yekê dide berçavan, ku hikûmeta Kanadayê erkên xwe yên navdewletî yên derbarê mafên mirovan de li hember Kanadiyên, ku di rewşeke awarte de li bakurê rojhilatê Sûriyê hatine binçavkirin, binpê dike. Herwiha alîkarî û piştgiriya pêwîst nedaye malbatên wan kesan yên ku dixwazin pêwîstiyên jiyanê yên bingehîn wek xwarin û dermanan bigihînin merivên xwe yan jî wan vegerînin malên wan. Yek ji erkên ku Kanadayê binpêkirine ew e, ku divê ew gavên pêwîst bavêje daku alîkariya wan welatiyên xwe yên li derve bike yên ku rastî metirsiyên dijwar tên, mîna metirsiyên li ser jiyanê, îşkencekirin û reftara nemirovatî û heqaretê.

Rapor herwiha dibîne ku hikûmeta Kanada dibe ku rê nede yan jî astengiyên neyasayî derxîne pêşiya alîkariya ku divê konsulxane pêşkêşî wan welatiyên xwe bikin yên ku li bakurê rojhilatê Sûriyê bi gumana têkildariya bi DAÎŞê re hatine binçavkirin. Ew rêxistin jî rêxistineke çekdarî ya navdewletî ya îslamî ye ku gelek tawanên ku nayên hejmartin pêk anîne di nav de tawanên şer û tawanên li dijî mirovahiyê û jenosîdeke eşkere. Li gorî yasaya navdewletî, nabe konsulxane alîkariya xwe li ser bingeheke cudakarî yan li ser bingiha ol yan jî nêrînên siyasî yan jî yên din qedexe bike.

Malbatên kesên ku hatine binçavkirin ji Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan (HRW) re gotine ku rayedarên Kanadî ne tenê şert û mercên ku tê de hatine binçavkirin baş nekirine, lê heta têkilî bi merivên kesên binçavkirî re jî nekirine. Kanadayê herwiha hêsankarî nekirine ku lêkolînê derbarê welatîbûna 20 zarokan yan jî zêdetir de, ku li Sûriyê ji dayik û bavekî Kanadayî jidayikbûne bike û ew zarok wiha hiştine bê ku welatîbûneke wan ya fermî hebe. Endamên vê

malbatê jî gotine ku hikûmetê negotiye ka dema ew pereyên xwarin, derman û cilên germ ji merivên xwe yên binçavkirî re bişînin, gelo ewê bi piştgiriya terorê bêne sûcdarkirin yan na.

“Kiran,” ku meriva hin ji wan kesên girtî ye û li Kanadayê dijî, digirî û metirsiya xwe tîne ziman ka gelo ewê ji ber alîkarîkirina hersê neviyên xwe were cezakirin:

> Ma tenê dixwazin ku ew bimirin? Ya ku xuya dike ev e....Ev zarok wê ji kûderê xwarin, derman û vîtamînan peyda bikin?...Hûn alîkariya wan nakin ji bo ku zindî bimînin û ne jî dihêlin ez alîkariya wan bikim.

Piştî ku Covid-19 gihişte Sûriyê, êdî dilgiraniyên van malbatan zêdetir bûne, nexasim ku vîrûs li wan navçeyan zêdetir belav dibe dema ku hejmareke gelek ya xelkê tê de kom dibin û mercên tenduristiyê xirab bin û herwiha bergiriya laşê mirovan jî li wir qelis be. Ji ber Covid-19 “jiyana Jack ji her demekê bêtir di metirsiyê de ye”, Sally Lane, dayika welatiyê Kanadî yê binçavkiri, Jack Letts, di emailekî de tîne ziman ku ji Wezareta Karûbarên Derve ya Kanadayê re şandiye û di rêya xwe de bi Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan (HRW) re parve kiriye. Dibêje jî: “Gelo wê hikûmeta Kanadayê bihêle kurê me di zindanê de li bakurê rojhilatê Sûriyê bimire?”

Dema ev rapor dihat nivîsandin, Kanadayê ji ber Covid-19 zêdetirî 40000 welatiyên xwe yan jî yên ku mafê wan yê niştecîbûna herdemî heye ji 100 welatan vegerandin yan ji bo vegerandina wan alîkarî pêşkêş kir, di nava wan de jî 29 kes ji Sûriyê vegerandin, lê yek ji wan jî ne ji wan 47 welatiyên wê bû ku bêsuc li bakurê rojhilatê Sûriyê hatine binçavkirin.

Berpirsên Kanadî dibêjin ku wan ji ber metirsiyên ewlekariyê û ji ber konsulxaneya wan li Sûriyê tune ye nekarîne karên zêdetir ji bo girtiyan bikin. Wezîrê Derve yê Kanadayê, François-Philippe Champagne di nameyekê de ku di Hezîrana 2020an de ji Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan (HRW) re şandiye wiha nivîsandiye: “Ji ber reşwa elwekariyê û ji ber ku tu hebûneke me li ser erdê tune ye, îmkan û karînên hikûmeta Kanadayê ji bo ku alîkariyên konsulxaneyî pêşkêşî her beşekî li Sûriyê bike gelekî sînordar in”. Wiha jî dibêje: “Lê tevî vê yekê, berpirsên konsulxaneyî yên Kanadayê bi awayekî rasterast têkiliyê bi Kanadiyên di girtîgehên [Rêveberiya Xweser] de ... yan jî bi endamên malbatên wan li Kanadayê dikin daku agehdarî cih û rewşa jiyana wan bin”. Champagne herwiha gotiye ku Karûbarên Cîhanî kanaleke têkiliyê bi rayedarên navxweyî li bakurê rojhilatê Sûriyê re çêkiriye daku “heta ku îmkan heye jiyaneke xweş ji wan [girtiyan] re peyda bike”.

Tevî vê yekê, herî kêm 20 welatan ji naverasta Cotmeha sala 2019an û pê de ji welatiyekî heta sed welatiyên xwe ji heman kamp û girtîgehên li bakurê rojhilatê Sûriyê vegerandine, di nav de

welatên wek Danmark, Fînlanda, Fransa, Almanya, Norwêc, Berîtanya û Amerîkayê jî hene. Herî dawî jî Fransayê 10 zarok di meha Hezîranê de vegerandin.

Karûbarên Cîhanî ji endamên wan malbatan re gotine ku ewê alîkariya girtiyan bikin eger xwe bigihînin konsulxaneyên wan li derve. Lê bêyî pere û nasname û bêy ku hikûmeta Kanada tevbigere, ev welatiyên girtî nikarin ji kampên girtî û girtîgehan birevin, herêmên şer derbas bikin û sînor jî derbas bikin, tu rêyek li pêşiya wan tune ye ji bo ku xwe bigihînin konsulxaneyên Kanadî li Iraq û Tirkiyê ku bi sedên kîlometeran dûr in.

Ev rapor li ser bingeha lêkolînên Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan (HRW) hatiye nivîsandin, di nav de jî hevdîtinên ku di navbera Kanûna sala 2019an û Nîsana 2020an de bi 11 endamên malbatên Kanadiyên ku li bakurê rojhilatê Sûriyê girtî ne, hatine pêkanîn. Ew endam ku ji 10 malbatên cuda ne, li Kanada yan jî li derve bûn û merivên 19 welatiyên Kanadî ne ku li bakurê rojhilatê Sûriyê binçavkirî ne. Lêkolerên HRW herwiha hevdîtin bi çar girtiyên Kanadî re pêkanîn -yek ji wan di Sibata 2019an de li bakurê rojhilatê Sûriyê, du jî di Hezîrana 2019an de li bakurê rojhilatê Sûriyê û yê din jî di Nîsana 2020an de bi rêya telefonê. Tevî vê yekê, HRW ligel gelek aliyên din axiviye, wek rayedarên Kanadayê, endamên di Rêveberiya Xweser de, grûpên alîkariya mirovî yên ku li bakurê rojhilatê Sûriyê dixebitin, parêzer, endamên civaka sivîl û yên din daku girtiyan vegerînin welatên wan. Me herwiha nameyên ku girtiyan ji malbatên xwe û rayedarên Kanadayê re şandine, di ber çavan re derbas kirin. Lêkolerên HRW herwiha dema ku di sala 2018an û di Sibat û Hezîrana sala 2019an de serdana kampên li bakurê rojhilatê Sûriyê kiribûn, hevpeyvîn bi dehan girtiyan re pêkanîbûn.

Heta dema ku ev rapor dihat nivîsandin, tu bijardeyên navxweyî yan herêmî yan jî navdewletî ji bo lêpirsîn û darizandina biyaniyan ji aliyê hikûmetên ku welatiyên wan li bakurê rojhilatê Sûriyê tên binçavkirin nehatibûne çalakkirin. Di sala 2019an de hikûmetên rojavayî hizra avakirina dadgeheke tawanan li navçeyê goûbêj kirin ku armanca wê dadgehkirina gumanbarên biyanî yên di nava DAÎŞê de bûn, lê vê hizrê berdewam nekir. Di Sibata 2020an de Rêveberiya Xweser, ku êdî bi awayekî berdewam hêrs û bêhêvî dibû, ragihand ku ewê gumanbarên biyanî yên DAÎŞê bide dadgehkirin, lê piştî du mehan wê pilana xwe ji bo demeke nediyar rawestand.

Di du biryarên girêdar ên bi navê "çekdarên terorîst ên biyanî" ku di sala 2014an de hatine dayîn, biryara 2178ê ya 2014an û biryara 2396ê ya 2017an, Encumena Ewlekariyê ya Neteweyên Yekgirtî bang li welatên endam -di nav de Kanada jî- kir ku her kesê "beşdarî fînanskirinê, plansazkirin û amadekirinê dibe yan karên terorîstî pêk tîne yan jî piştgiriya karên terorîstî dike divê were dadgehkirin. Herwiha biryara 2396ê jî ji welatan dixwaze ku "stratejî û protokolên giştgîr pêşbixin û bicîbikin ji bo dîsan werin perwerdekirin û tevlî civaka normal bibin, ev yek jî

li gorî berpirsiyariyên xwe yên li gor yasayên navneteweyî, di nav de jî çekdarên terorîst ên biyanî û jin û zarokên wan".

Ji ber bijardeyên ji bo lêpirsîneke pêbawer li bakurê rojhilatê Sûriyê tune ne, lewra rêya tekane ya lêpirsînê bi her Kanadiyekî, ku di sûcên metirsîdar yên DAÎŞê de beşdar bûbe, ew e ku Kanada wan vegerîne cem xwe û lêpirsînê bi wan re bike yan jî, eger pêwîst be, wan bide dadgehkirin. Girtina gumanbarên ku tevlî DAÎŞê bûne û endamên malbatên wan di girtîgheke awarte de û heta demeke nediyar bêyî ku mafê wan hebe daxwaza azadiya xwe bikin, ew bi xwe jî formek cezayê bi komel pêk tîne - ku Kanada bi rêya ku nekariye alîkariya welatiyên xwe bike, bi xwe beşek ji berpirsiyariyê radike.

Li bakurê rojhilatê Sûriyê jî guncandina van kesan, ji bo ku dîsan tevlî civakê bibin, karekî pir zehmet û nemumkin e ji ber ku xizmetên psîkolojîk, civakî û bijîşkî li kamp û girtîgehên ku biyanî têde binçavkirî ne tune ne. Ji ber ku Kanadî li biyabenekê ne ku nêzîkî 9,000 kîlometran dûrî welatê xwe ne, lewra jinûveguncandina wan di civakê de karekî nemumkin e . Ev yek jî diyar dike ku vegera wan ji bo welat rêya tekane ye ku welatên endamên Neteweyên Yekgirtî dikarin bi vê rêkê re xwestekên Encumena Ewlekariyê yên ji bo dîsan guncandina wan girtiyan di civaka normal de pêk bînin. Vegerandina wan ji bo welatê wan jî tê wê wateyê ku Kanada bi erkê xwe rabûye û hemû hewldanên pêwîst û gengaz pêk anîne ji bo parastina welatiyên xwe ji îşkence yan jî her karekî din yê nemirovahî û xapînok, gefên li ser jiyanê û herwiha alîkarîkirina zarokan daku mafê wan ji bo welatîbûnê li wan vegere.

Ji ber van hemû sedeman, divê Kanada, wekî tiştek girîng û bilez, hemû Kanadiyên ku li bakurê rojhilatê Sûriyê hatine binçavkirin, vegerîne daku dîsa di civakê de werin guncandin û, heke pêwîst bike, wan bide dadgehkirin. Tedbîrên ku divê Kanada di destpêkê de pêk bîne ew in, ku derbarê welatîbûna wan kesan de lêkolînê bike, belgeyên geştkirin û rêwîtiyê ji welatiyan re derxîne, rêwîtiyeke ewle ji bo wan peyda bike ji bo bikaribin ji bakurê rojhilatê Sûriyê xwe bigihînin konsulxaneyên Kanada yan axa wê li derdorê. Wek pêbaweriyekê bi mafên zarokan, ku Kanada di gelek forûmên Neteweyên Yekgirtî de bergirî lê kirine, divê hikûmet zarokên Kanadî vegerîne welêt û di destpêkê de û berî her tiştekî wekî qurbaniyên destê DAÎŞê bide naskirin. Divê zarokên, ku dibe ku bi DAÎŞê re têkildar bûbin, wek mexdûr bên hesibandin û di rewşên taybet de û wek çareya dawî wan bide dadgehkirin. Divê zarok bêyî dayikên xwe - yên ku belkî bi xwe qurbaniyên destê DAÎŞê bin- neyêne vegerandin – nexasim eger belgeyên berbiçav tune bin ku wê yekê piştrast bikin ku veqetandin dê di berjewendiya herî baş ya zarok de be.

Di vê navberê de, Kanada divê piştrast bike ku hemû welatiyên wê, ku li bakurê rojhilatê Sûriyê binçavkirî ne, xwedî amraz û rêyên aktîv in ji bo ku daxwaza alîkariyên konsulxaneyî bikin wek

wergirtina paspor yan belgeyên nasnameyê yên din, û mafên wan hebe ku daxwaza guhertina şert û mercên dijwar û nemirovahî yên girtina xwe bikin. Kanada divê herwiha alîkariyên mirovahî zêde bike daku şert û mercên dijwar ji bo welatiyên xwe yên ku li bakurê rojhilatê Sûriyê binçavkirî ne, çareser bike.

Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan êrîşên çekdarî yên tundrew şermezar dike û li wê yekê mukir tê ku li ser Kanada erkekî yasayî ye ku mirovên li ser axa xwe biparêze. Di heman demê de em wê yekê berçav digirin ku Kanada di serdana welatiyên xwe de yan jî di alîkarîkirina ji bo vegera wan ji bo welatê wan de rastî astengiyên ewlekariyê tê. Lê ku dest ji wan welatiyên xwe berde, ku piraniya wan zarokên biçûk in, daku ji bo demeke nediyar û neyasayî herwiha di şert û mercên dijwar de bêne binçavkirin, wê ev yek nehêle ku Kanada ewletir bibe. Di şûna vê de, ew qurbaniyên DAÎŞê û malbatên wan dê ji wê yekê bêpar bihêle ku roja xwe li dadgehê derbas bikin, di heman demê de hin gazinan dike ku dibe metirsiyek ku alîkariya hewldanên çekdarkirina DAÎŞê û berdewamiya tundûtûjiyê bike.

# Qewîtî

## Ji bo hikûmeta Kanadayê

*Tevî Ofîsa Serokwezîr, Karûbarên Cîhanî ya Kanada, Ewlehiya Giştî ya Kanada, Wezareta Dadê û Parlamentoyê:*

- **Bi** away**ekî bilez**, vegerandina hemû welatiyên Kanadî yên ku li bakurê rojhilatê Sûriyê hatine binçavkirin, di serî de jî zarok û kesên ku pêwîstiya wan bi alîkariya bijîşkî ya lezgîn heye û yên din jî bi taybetî binçavkiriyên ku bergiriya laşê wan qels e. Herwiha vegerandina dayikan yan jî mezinên din jî bi zarokên wan re, û eger belgeyeke yekalîker hebe, dibe ku zarok bên veqetandin eger ev yek di berjewendiya herî baş ya zarokan de be û li gorî berpirsiyariyên yasayî yên navneteweyî yên derbarê yekîtiya malbatê be. Di nava karên vegerandina ji bo welat de ku Kanada divê pêk bîne, ku yekser lêkolînê derbarê welatîbûna wan de bê kirin, paspor ji welatiyan re bê derxistin, peydakirin yan jî kordînasyonkirin ji bo ku rêyeke ewle ji bakurê rojhilatê Sûriyê heta konsulxane û axa Kanadayê were peydakirin;
- Heta ku vegerin welat, divê kar bi sazîyên mirovahî û rayedarên herêmî re bê kirin daku şert û mercên li kampên bakurê rojhilatê Sûriyê bêne başkirin, di nav de jî pirbûna xelkê, nebûna mercên paqijiyê û çavdêriya bijîşkî, herwiha avakirina sîstemeke ku malbat bi rêya wê sîstemê bikaribin pereyan ji binçavkiriyên li bakurê rojhilatê Sûriyê re bişînin daku ew jî bi tenê ji bo pêwîstiyên bingehîn yên jiyanê wek xwarin, derman û cilan bikar bînin;
- Dema ku kesên binçavkirî vegerin, divê kar bê kirin ji bo ku ew di civaka normal de bêne guncandin, û eger pêwîst be, lêpirsîn bi wan kesan re bê kirin yên ku guman heye destê wan di tawanên metirsîdar de heye, ev yek jî li gorî pîvanên navdewletî yên dadgeheke dadperwer û dadmend;
- Garantî hebe ku Programa Tawanên li dijî Mirovahiyê û Tawanên Şer, di nav de Beşa Lêpirsînên Hestiyar û Lêpirsînên Navdewletî ya Polîsê Kanadayê (Royal Canadian Mounted Police), hemû pêwîstiyên wê û karmendên wê berdest in, ji bo vekolînên ji bo her Kanadiyên ku guman heye tevlî wan tawanên navdewletî yên metirsîdar bûne ku li derve hatine pêkanîn;
- Divê li ser hemû îdîayên îşkence û reftara nemirovahî, ku li hember Kanadiyên ku li bakurê rojhilatê Sûriyê hatine binçavkirin, lêkolîn were kirin. Divê guvaş bêne bikaranîn daku rayedarên berpirsiyar ji her reftareke xirab ya piştrastkirî werin cezakirin;
- Divê alîkariya konsulgerî ya aktîv di yasaya Kanadî de were aktîvkirin;
- Ofîsek were avakirin ji bo ku bi awayekî serbixwe çavekî di ser xizmetên konsulgerî re derbas bike, ev yek jî bi armanca parastina welatiyan û misogerkirina pêkanîna tam ya

berpirsiyariya yasayî ya navneteweyî bi rêya peydakirina alîkariya konsulgerî û bê cudahî;

- Piştgiriya pejirandina komek standardên cîhanî ya derbarê piştgiriya konsulgerî de ji hêla welatan ve ji bo kesên xwe yên biyanî yên ku li derve hatine binçavkirin, ku giraniyê dide ser wê çendê ku alîkariyên pêwîst û aktîv bêne pêşkêşkirin.

*Karûbarên Cîhanî ya Kanada:*

- Li benda vegera ji bo welat, divê yekser alîkariya konsulgerî ya aktîv û bibandor ji welatiyên Kanadî yên ku li bakurê rojhilatê Sûriyê binçavkirî ne were pêşkêşkirin, herwiha divê hemû tedbîrên gengaz bên girtin daku reftara mirovahî ligel wan were misogerkirin. Wek beşek ji vê hewldanê, divê ew yek were piştrastkirin ku hemû welatiyên binçavkirî xwedî amrazên bibandor bin daku peywendiyê bi rayedarên konsulgeriyê re bikin, herwiha di cih de bersiva daxwazên binçavkiriyan û endamên malbatên wan yên li Kanada û li her cihekî din yên derbarê alîkariya konsulgerî de were dayîn, herwiha siyasetên girêdayî lêkolîna li ser nasnameya wan ya kanadayî were zelalkirin û malbatên Kanadî jî bi awayekî rêkûpêk agahdarî rewşa xizmên xwe yên binçavkirî bêne kirin;
- Divê li hember cudakariya di xizmetên konsulgerî de siyasetek bêdilovanî were bicîkirin.

*Wezareta Dadê, Karûbarê Dozgeriya Giştî ya Kanada, Ewlehiya Giştî ya Kanada tevî polîsê Kanada (the Royal Canadian Mounted Police):*

- Li gorî pêwîstiyê, di serî de lêkolîn û pêdeçûnên dadwerî ji bo wan girtiyên vegeriyayî bê kirin ku dibe ku destê wan di tawanên navdewletî yên metirsîdar de hebin – wate tawanên şer, tawanên li dijî mirovahiyê û kiryarên potansiyel yên jenosîdê;
- Di diyarkirina bersivên dadweriya cezayî de ji bo hemû gumanbaran, di nav de jin û zarok jî, divê rolên cûrbicûr bêne berçavgirtin, rolên wan ku ligel DAÎŞê bûn û rolên wan ên potansiyel jî wek qurbaniyan, çi ji aliyê DAÎŞê ve, weke jin û zarokên ku bazirganî bi wan hatiye kirin yan jî bi rengekî din hatine xapandin an bikaranîn, an jî di bin zext û guvaşa DAÎŞê de tevlî wê grûpê bûne- çi ji aliyê rayedarên li bakurê rojhilatê Sûriyê ve ku ew binçav kirine;
- Dema ku tawanbarkirin were peydakirin, divê hizir li alternatîvên zindanê ji bo jinên ku xwedan zarokên biçûk in bê kirin. Di rewşên zindankirinê de, divê hemû hewldan bêne dayîn daku cihê jinan di avahiyên rêkûpêk de bin ji bo ku zarokên wan bi rêkûpêk bikaribin biçin serdana wan bikin;
- Divê zarokên ku têkilî bi DAÎŞê re kirine, di serî de û berî her tiştî, wek qurbanî bêne hejmartin, ligel vê yekê jî divê ew yek berbiçav be ku bikaranîna zarokên di bin 18 salan de ji hêla grûpên çekdar ên navdewletî ve wek binpêkirina yasaya navneteweyî tê hejmartin. Li gorî Peymana Mafên Zarokan, protokola wê ya nepêgir ya derbarê beşdarkirina zarokan di milmilaneyên çekdarî de û herwiha pîvanên dadgekirina

zarokan, divê darizandin û binçavkirina zarokan tenê wek pîvanek awarte û dawî ya çareseriyê were standin. Li gorî pêşniyarên Neteweyên Yekgirtî jî, divê temenê berpirsiyariya tawanbariyê li Kanadayê ji bo hemû tawanan ji temenê 12 salan ji bo 14 heta 16 salan were bilindkirin;

- Kontroleke rêkûpêk ji wan hemû tedbîran re were kirin ku ji bo çavdêrîkirina gumanbarên DAÎŞê yên ku hatine vegerandin, wek peymanên aştiyê û qedexeyên geşt û rêwîtiyê daku were naskirin ku ew ne neguncayî ne;
- Kar û xizmetên ji nû ve perwerdekirin û guncandina di civakê de ji binçavkiriyên vegerandî re were peydakirin, wek piştgiriya bijîşkî û psîkolojîka civakî. Herwiha bernameyên taybet bi regez, temen, pêwîstiyên xwendinê, paşxaneya çandî û mercên hemû kesên vegerandî were peydakirin, tevî rewşa wan ya potansiyel wek qurbaniyên DAÎŞê.

## Ji Rêveberiya Xweser ya bakurê rojhilatê Sûriyê re, di nav de Encûmena Sûriya Demokratîk û Hêzên Sûriya Demokratîk

- Di dema vegerandin an jî li benda vegerandinê de, divê welatiyên biyanî yên binçavkirî di demeke herî zû de rastî dadgehek pêbawer bêne kirin daku pêwîstî û yasayîbûna binçavkirina wan were diyarkirin. Hemû girtiyên ku rastî tu tawanan nehatine yan jî yên ku dadgehê biryara binçavkirina wan nepijirandiye, divê serbest bên berdan;
- Başkirina bilez a rewş û mercên di zindan û kampên ku tije xelk in û netendurist in, herwiha Başkirina dema nebes a mayîna girtiyan li derve ligel peydakirina çavdêriya tenduristî li gorî standardên Neteweyên Yekgirtî yên nimûneyî yên taybet bi reftara ligel girtiyan (standardên Mandela). Divê destûr jî ji bo xebatkarên mirovahî were dayîn daku di cih de alîkariyên ku jiyanê rizgar dikin pêşkêş bikin;
- Divê binçavkirina zarokan wek tedbîra awarte û çareseriya herî dawî were pêkanîn û nabe zarok tevlî kesên mezin werin binçavkirin;
- Belavkirina lîsteya navên kesên ku di zindanê de jiyana xwe jidest dane û parvekirina nav, nasname, sedema mirinê û cihê binaxkirina wan bi malbatan re;
- Kar bê kirin daku girtiyên ku tenduristiya wan pir xirab e, li ser bingeha sedemên mirovahî, serbest bên berdan, di nav de jî kesên kêmendam û yên ku nexwşiyên wan yên giran hene;
- Piştrastbûn ku girtî agahdarî mavê xwe ne ku daxwaza alîkariya konsulgerî bikin herwiha rêyeke wan hebe ku têkiliyê bi berpirsên konsulgerî re bikin;
- Hêsankarî bên kirin daku kesên binçavkirî bikaribin têkiliyê bikin, hem bi endamên malbata xwe yên li derve dijîn û hem jî ligel endamên malbata xwe yên ku li bakurê rojhilatê Sûriyê bi cuda bi gumana têkiliya bi DAÎŞê re hatine girtin;

- Alîkariya wan welat û malbatan were kirin yên ku dixwazin welatiyên biyanî yên binçavkirî vegerînin welatên wan yên resen daku rastî îşkencekirin, reftara xirab yan jî darizandinên nedadperwer neyên.
  Derbarê îdîayên îşkencekirin yan reftara xirab ya ligel girtiyan de lêkolîn were kirin û lêpirsîn jî bi kesên berpirsyar re were kirin.

## Ji bo saziyên Neteweyên Yekbgirtî

*Tevî Sekreterê Giştî, Encûmena Ewlehiyê, Komîsyona Bilind a Penaberan (UNHCR), Rêxistina Zarokan a Neteweyên Yekgirtî (UNICEF), Ofîsa Neteweyên Yekgirtî ya Rûbirûbûna Terorê (UNOCT) û Ofîsa Neteweyên Yekgirtî ya Madeyên Hişbir û Tawanê (UNODC)*

- Guvaş li ser hikûmeta Kanada bê kirin daku welatiyên xwe, û berî her tiştî, zarokên Kanadî yên hatine binçavkirin, vegerîne.
- Hewldanên zêdetir bên kirin daku bersiveke navdewletî ya bilez û xurt derbarê binçavkirina gumanbarên biyanî yên DAÎŞê û endamên malbatên wan heta demeke nediyar de were kordînekirin, ev yek jî li gorî standardên navneteweyî yên mafên mirovan û biryara Encûmena Ewlehiyê ya Neteweyên Yekgirtî 2178 ya sala 2014 û biryara 2396 ya sala 2017 herwiha standardên Mandela û prensîpên Rêbernameya Madrîdê ya sala 2015 û herwiha jî paşkoya 2018 ya derbar diyardeya çekdarên biyanî. Divê ev bersiv van bendan lixwe bigire:
  - Vegerandina bilez ya hemû welatiyan ji bo welatên wan, bi şertê ku di dema vegerê de ew rastî metirsiya îşkenceyê yan her karekî din yê nemirovahî nebin, di destpêka hemûyan de jî divê zarok, kesên ku alîkariyek bijîşkî ya bilez ji wan re pêwîst e û kesên din jî yên ku bergiriya laşê wan qels e, bilez bêne vegerandin.
  - Bernameyên ji nû ve amadekirinê ji bo ku di civakê de bên guncandin;
  - Eger pêwîst bike, dadgehkirina wan li welatên wan yên resen ku dikarin darizandinên dadperwer peyda bikin;
  - Niştecîkirin, û eger pêwîst be dadgehkirin jî, li welatê sêyemîn , ji wan girtiyan re ku rastî metirsiya îşkenceyê yan her karekî din yê nemirovahî tên yan jî rastî dadgehekirinên nedadperwer hatibin, dema ku vegerabin welatê xwe;
  - Zêdekirina bilez a alîkariyên mirovahî ji bo kamp û girtîgehên li bakurê rojhilatê Sûriyê bi armanca bidawîkirina şert û mercên giran û gelemperî yên ku gelek caran gefê li jiyanê dikin.
  - Alîkarî ji rayedarên li bakurê rojhilatê Sûriyê re yên ku wan kesan binçav dikin bê kirin daku dadgehek pêbawer biafirînin ji bo ku bi bliez û bi dadperwerî yasayîbûn û pêwîstiya girtinan binirxînin.

## Ji bo welatên xêrder û endamên Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAÎŞê, tevî Kanada

- Guvaş li ser welatên resen were kirin û herwiha alîkariya wan jî were kirin ji bo vegerandina biyaniyên ku li bakurê rojhilatê Sûriyê binçavkirî ne di rewşên ku kesên vegeriyayî di dema vegerê de rastî metirsiya îşkenceyê û reftara xirab û dadgehkirinên nedadperwer nebin, di vir de jî divê di serî de zarok û kesên pêwîstiya wan bi alîkariya bilez ya bijîşkî heye û kesên ku bergiriya laşê wan qels e, bên berçavgirtin;
- Guvaş li ser welatan were kirin daku kesên ku ji bakurê rojhilatê Sûriyê vegeriyane dubare bên amadekirin û di civakê de werin guncandin herwiha lêpirsên ligel wan bê kirin, û eger pêwîst be, li gorî dadgehên dadperwerî yên navdewletî û pîvanên ciwanan bên dadgehkirin;
- Alîkarî bê kirin daku binçavkiriyên ku rastî metirsiya îşkencekirinê yan her karekî din yê nemirovahî yan jî dadgehên nedadperwer werin dema ku vegerin welatên xwe, daku li welatê sêyemîn bên niştecîkirin û eger guncayî û mumkin be, li wî welatê sêyemîn bên dadgehkirin.

*Li benda vegerandin û dubare niştecîkirinê:*

- Zêdekirina bilez a alîkariyan ji bo kamp û girtîgehên li bakurê rojhilatê Sûriyê bi armanca bidawîkirina şert û mercên giran yên ku gefê li jiyanê dikin, herwiha misogerkirina çavdêrîkirina pêwîst, di nav de jî pêşîgirtin, taqîkirin û dermankirina Covid-19, sil, gurrî û nexweşiyên din, herwiha peydakirina cihê mayînê, ava paqij, bijûn (sanîtet) û, ji bo zarokan, perwerdekirin;
- Kordînekirina alîkariyên mirovahî ji welatên biyanî yên xêrder û Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAÎŞê bi aktorên mirovahî yên têkildar re li bakurê rojhilatê Sûriyê;
- Guvaş li ser Rêveberiya Xweser li bakurê rojhilatê Sûriyê û Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) were kirin daku hêsankariyan bidin têkiliya birêkûpêk û bibandor di navbera girtiyan û endamên malbatên wan de -hemû xizmên li derve û kesên ku bi gumana têkildariya bi DAÎŞê re li bakurê rojhilatê Sûriyê bi cuda hatine binçavkirin- herwiha peydakirina alîkariya teknîkî û darayî ji bo têkiliyên bi vî awayî;
- Alîkarîkirina rayedarên li bakurê rojhilatê Sûriyê yên ku ew kes binçavkirine daku bilez dadgeheke pêbawer a yasayî ava bike ji bo pêdeçûneke dadperwer û pak derbarê yasayîbûn û pêwîstiya binçavkirina biyaniyan li kamp û girtîgehan de bike.
- Piştgiriya darayî û teknîkî ji rayedarên li bakurê rojhilatê Sûriyê re yên ku wan kesan binçav dikin were peydakirin daku wê yekê misoger bikin ku hemû girtî di navendên fermî yên binçavkirinê de bên bicîkirin ku li gorî standardên bingehîn yên navneteweyî bin, tevî standardên dadgehkirina ciwanan.